

Danasîna Pirtûkan

Berhevkirin: Gerok

Kurd û Kurdistan. Dîrok

Arshak Safrastian


Weşanên Avesta, 124 rûpel e

“Kurd û Kurdistan” yekem car di sala 1948 ê de, li Hollandayê bi îngilîzî, dû re li Îranê bi zimanê farisî û pişt re jî li başûrê Kurdistanê jî bi zimanê erebî hatiye weşandin. Pirtûka niha bi wergera Ergîn Opengîn ji zimanê îngilîzî ji bo zimanê kurdî hate wergerandin. Tê de li gel du nexşeyên Asyaya Bicûk û Îranê hinek wêneyên resen yên ji jiyana kurdan ya civakî jî hene.

Destpêk û şeş beşên Pirtûkê bi qewlê berhevokeke xurt ya qeyd û belgeyên ser dîrok û jiyana kurdan ya ji 2000 B.Z. ve ye. Qonaxên girîng yên rabirduya gelê kurd, yek bi yek hatine ravekirin, bes di pirtûkê de, girîngiyêke taybet li ser têkoşîna kurdan ya li dijî Osmaniya ji 1826 ê ve heye.

Nivîskarê pirtûkê, Arshak Safrastian, akademîsyenê ermen e. Li Kurdistanê di nav kurdan de, maye û serborên xwe yên li gel, gel û serokên kurdan vedibêje bo peytandina argumanên xwe. Nivîskar bi dîtina rewşenbîrekî kurd, li meseleyan dinêre û her wiha tim balê dikêşe ser rabirduya hevpişk ya gelên eslî yên herêmê, anku kurd, ermen, aşûrî hwd.

Dîsa, ji bo warê werger û weşangeriya kurdî, ciyê serbilindiyê ye ko êdî ne tenê pirtûkên edebî, belkî yên zanistî jî, ji bo kurdî dihên wergerandin.



Çû. Kurteçîrok

Enwer Karahan

Weşanên Dozê 2006. 160 rûpel e.

Piraniya bûyeran li herêma Dêrika Çiyayê Mazî derbas dibin. Mijar nasandina herêm û kesên herêmê yên hêja ne.

Di “Çû” de hesreta welatê bav û kalan, xemgîniya wendakirina egîtan, hestên biyanîyê, daxwazên nîvcomayî û qirmîçî hene.

Bi gotinên pêşîyan, nifir, pesn û çêran nivis hatine xemilandin û pileya berhemê bilind kirine. Lewra çêja xwendinê bi mirov xweş û geş dîkin.




**Hilmek ji çiya û zozanên Kurdistanê. Helbest
Mahsum Özer
130 rûpel e**

Di helbestan de, xweşikbûna xwezaya Kurdistanê derdikeve pêş. Êş, kul û keserên civakî, pirsarî neteweyî, rengê xweş didin naveroka wan. Zimanê Özer xwezayî ye. Kesên bi kurdî dixwînin û dinîvisînin dikarin baştir wî, cîhana wî fêm bikin. Carna bi zimanê rojane, carna jî derdikeve derveyî sînoran û kûrtir peyvên helbestan rêz dike. Carna dibe evîndar. Dibe zimanê Mem û Zînê. Li evîna xwe digere, axîn û nalîn pê dikevin. Dibe nûnerê evîndaran, jana dilê wan dirêje ser kaxezê.

*"Ay lê qedere qedere
tu bûye êşa serê raman.
Jê nagerê.
Te dest û lingê min
kirine qeydê.
Bi kefenê reş pêçam
bi saxî avêtî me qebrê.
Lê qedere..."*

**Dora Bacinê bi dar e. Roman
Medeni Ferho
Weşanên Tevn**

Roman, her çiqasî li ser tolvekirina ku weke birîneke mûmarî di nava gelê kurd de, cihekî giring digire û heya îro kesî nikariye neşterekê lê bide, bi çend aliyên hatiye nirxandin. Ji aliyekî ve, feodalîzma ku tirseke mezin ava kiriye, ji aliyê din ve qalibên bi saya feodalîzmê, civaka kurdî givaştiye, cih girtiye. Ji aliyê din ve rewşa kambaxî ya psîkolojîk, ku kesayetiya kurd perçiqandiye heye.



Qaremanê sereke yê romanê, Koçek Birahîm, her çiqasî dixwaze ku zext û zora olî ji ser civaka Êzdî biavêje, taqeta wî nagihîye. Lehengên romanê rast in, hinek ji wan hîna dijîn. Mirov dikare bibêje ku romana Medenî Ferho, Dora Bacinê bi dar e, jiyana birîndar ya civaka kurdan e. Her çiqasî ciwanên weke Serhan û Usê, kalên weke Xelo, Hiseyn, Cemîl û Xemo xwe li dora Koçek Birahîm bidine hev û bi dilsozî nêzîkî pirsgirêkê dibin jî, bûyera giran ranagirin û dibin pirsgirêkan de diwestin.